



Ziman û Integrasyon

Integrasyon

Derfetên integrasyonê

Ziman

Hînbûna almanî

Integrasyon

Gava hûn li kantona Basel-Stadtê rûdinin, mafên we yê diyar hene. Ne xem e, bê hûn mêr an jin in, hûn ji ku derê ne, hûn bi çi zimanî diaxivin, baweriya xwe bi kîjan olê tînin an jî çi astengdariyên we hene. Di heman demê de, divê hûn li gor zagonan tevbigerin. Ji bilî vê, girîng e, ku hûn debara xwe ya aborî bi xwe bikin û almanî hîn bibin. Li jêr agahiyên li ser vê yekê hene.

Prensîbên herî girîng

Ger hûn li Swîsreyê rûdinin, divê hûn li gor zagona bingehîn a federalî û zagonên din tevbigerin.

Ev wek mînak tê vê wateyê: Hemû mirov li hember hev rêzdar in. Nêzîkatiya wekhev wê li hember herkesî were kirin û wê ti kes li rastî cudakariyê neyê. Gava hûn li Baselê rûdinin, divê hûn almanî hîn bibin. Ji bilî vê, divê hûn bi xwe debara xwe ya aborî bikin. Lê integrasyon, gava hemû kes bi hev re bikin bikêrhatî dibe. Divê nişteciyên Baselê li hember we vekirî bin. Divê ew we agahdar bikin û alîkariya we bikin.

Berpirsyariya xwe bi xweyî

We nû bar kiriye, hatine Baselê? Konfederasyon, kanton û şaredarî li ser radiwestin, ku hûn bi awayekî dadwer derfetên ketina nav jiyana aborî, civakî û çandî bi dest bixin. Lê divê hûn bi xwe jî ji bo vê yekê hewl bidin, da ku hûn xwe integre bikin. Em ji we hêvî dikin, ku hûn derfetên ji bo integrasyonê bi kar bînin.

Tevlêbûna jiyana civakî

Hûn dikarin xwe integre bikin: Hûn dikarin li komeleyan pir xweş mirovên nû nas bikin.

An jî hûn biçin şahî û pêşangehên li taxa hûn lê rûdinin.

Dibe ku destpêkê ji bo we hinekî zehmet be. Hinek mirov li hember kesên ji welatên din, ne vekirî ne. Lê piştî demekê piraniya mirovan şerma xwe radikin. Ji ber vê yekê, dev jê bernedin.

Agahî / Alîkarî

Hûn nû hatine Baselê û pêdiviya we bi alîkariyê yan agahiyan heye? Li Basel-Stadt gelek ciyên cuda yên hûn serî lê bidin hene. Li saziyên kantona Basel-Stadtê û li şaredariya hûn lê rûdinin wê agahiyan bidin we. Lê wekî din ciyên danûstendinê yê taybetî ji bo koçber û penaberan jî hene.

Agahiyên li ser jiyana li Swîsreyê û ji bo mijarên din:

- GGG Migration

Agahiyên ji bo mafê penaberiye û zagona koçberiyê:

- Beratungsstelle für Asylsuchende BAS
- Freiplatzaktion

Hûn hîn nikarin bi almanî biaxivin? Wê demê, hûn dikarin keseke, kesekî ji bo we wergerê bike bi xwe re bibin. Hûn dikarin daxwaza wergervanekê, wergervanekî jî bikin.

Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/sprache-und-integration/integration

Derfetên integrasyonê

Hûn dikarin xwe li xwendegehê, li perwerdeyê û li ser kar baş integre bikin. Lê dibe ku hîn karê we tine be û we dest bi perwerdeyê nekiribe. Û hûn naçin xwendegehê jî. Wê demê hûn dikarin gelek derfetên integrasyonê bi kar bînin.

Derfetên taybetî

Ji bo mirovên nû bar kirine, hatine Baselê, gelek derfetên taybetî hene. Wek mînak komikên axavtinê, derfetên ji bo dema vala, civîn, kombûn an jî kursan. Derfet alîkariyê didin we, ku hûn karibin bi cî bibin û mirovan nas bikin. Ciyê şêwirmendiyê "GGG Migration" we agahdar dike, bê çî derfet hene.

Kanton û şaredarî ji bo bixêrhatinê li nişteciyan bikin, çalakîyan li dar dixin. Li van deran agahiyên girîng didin we û hûn dikarin bibin xwediyê nêrîneke destpêkîn.

Komele

Gelek Swîsreyî endama, endamê komeleyekê ne (Verein). Komeleyên baldariyên cihêreng hene, wek mînak komeleyên werzişî yan komeleyên çandî. Gava hûn beşdarî komeleyekê bibin, hûn dikarin mirovên din nas bikin. Piraniya komeleyan ji hemû kesan re vekirî ne.

Rêxistiniyên koçberiyê

Komeleyên koçberan jî hene. Endamên komeleyan bi piranî bi heman zimanî dipeyivin, ew ji heman welatî tî û girêdayî heman olê ne. Komeleyên wiha bi piranî derfetan pêşkêşî mirovên nû hatine Swîsreyê yan kantona Basel-Stadt dikin. Ew dikarin di rîya integrasyonê de alîkariya we bikin.

Derfetên ji bo ciwanan

Ciwan dikarin di dema xwe ya vala de gelek derfetên hevnasîna hevtemenên xwe bi kar bînin. Ew dikarin projeyekê bi hev re çêkin û nêrînen xwe pêşniyar bikin. Kesên pispor jî şêwirmendî û destekê didin ciwanan (Jugendarbeit). Ev derfet bi gelemperî belaş in.

Ciyên hevdîtinê yên li taxê

Ciyên hevdîtinê yên li taxê (Quartiertreffpunkte) ji bo hemû mirovan vekirî ne. Ew ji bo malbat, ji bo kalûpîr û mirovên hîn hindik bi almanî dizanin derfetan pêşkêş dikin. Hinek ciyên hevdîtinê navendên malbatan in. Li van deran hevdîtina vekirî ya ji bo dayik û bavên bi zarokên xwe re tîn heye. Ciyên hevdîtinê yên li taxê di jiyana rojane de şewirmendî û alîkariyê didin we. Hûn dikarin li ciyên hevdîtinê yên taxê ji bo şahiyên malbatî û pîrozbahiyên din odeyan kirê bikin.

Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/sprache-und-integration/integrationsangebote

Ziman

Hûn hatine Basel-Stadt û hûn hîn bi almanî nizanin? Wê demê, divê heta ji dest we tê bi lez almanî hîn bibin. Gava hûn karibin ziman biaxivin, hûnê welêt û mirovan çêtir nas bikin. Û hûnê hêsantir karekî bibînin.

Almaniya standart / almaniya Swîsreyê

Li Swîsreyê çar zimanên welêt hene: Almanî, Fransî, Îtalî û Retoromanî. Li kantona Basel-Stadt almanî zimanê fermî ye. Almaniya bilind û almaniya Swîsreyê heye.

- Almaniya standart (Standarddeutsch)
Mirovên li Swîsreya almnaîxêv bi almaniya standart dinivîsin. Û ew li xwendegehê û qismî li radyo û televizyonan bi almaniya standart diaxivin.
- Almaniya Swîsreyê (Schweizerdeutsch)
Almaniya Swîsreyê zaravayeke zimanê almanî ye. Mirov di jiyana rojane de piranî bi almaniya Swîsreyê diaxivin. Dibe ku fêmkirina almaniya Swîsreyê tevî hûn baş bi almanî diaxivin jî, ji bo we zehmet be. Hûn hin tiştan fêhm nakin? Wê demê hûn dikarin ji mirovan bixwazin, ku ew bi we re bi almaniya standart biaxivin. Hûn bi xwe ne mecbûr in bi almaniya Swîsreyê biaxivin. Lê girîng e, ku hûn piştî demekê êdî fêhm bikin.

Almanî û zarok

Zaroka we bi zimanekî ji almanî cudatir diaxive? Wê demê, bila heta ji dest were bi lez zarokên almanîxêv nas bike. Bi vê riyê wê zaroka we bileztir hîn bibe. Wek mînak ew dikare biçe nav komeke lîstinê. Wekî din jî derfetên taybetî yê ji bo dêûbav û zarokan hene.

Zaroka we hîn almanî naaxive yan kêma diaxive? Wê demê, divê zaroka we herî dereng salek berî baxçê zarokan hîn almanî bibe. Emê berî baxçê zarokan bi 18 mehan bi nameyekê we agahdar bikin. Ev derfet wek mînak ji bo van tiştan e:

- Koma lîstinê, ya bi hîndekariya almanî
- Navenda lîstîna rojane (Kîta) ya bi almanî tê axavtin
- Malbata rojane (Tagesfamilie)

Hûn dikarin ji bo bipêşdebirina zimên jî alfkariya zaroka xwe bikin. Bi zaroka xwe re pir biaxivin, li zaroka xwe guhdarî bikin û ji zaroka xwe re çîrokan bibêjin. Bi zimanê hûn herî baş dizanin û herî zêde li ber dilê we şêrîn e, biaxivin.

Werger û xizmeta wergerî (tercumanî)

Hûn nû hatine Baselê û hîn bi almanî baş naaxivin? Wê demê carinan pêdiviya we bi miroveke, mirovekî ji we re wergerê bike heye. Dibe ku hûn karibin ji xizmên xwe yan nasên xwe bipirsin.

Lê hinek axavtin zehmet an jî pir taybetî ne. Wek mînak qewlekî (randevû-termin) li nexweşxaneyê yan jî li ba rayedaran (memûran). Wê demê dibe ku xwestina wergereke navçandî, ji bo we çêtir be. Ew pisporên beşa xwe ne û bi taybetî ji bo kesên ji çandeke din tên wergeriyê dikin. Ew kesên pispor çanda we nas dikin û dikarin wiha wergerê bikin, ku hûn tevî fêhm bikin.

Ji saziyan nameyek ji we re hat û hûn qet jê fêhm nakin? Yan jî, divê hûn formekê dagirin an nameyekê binivîsin? Ev der alfkariyê dide we:

- Xizmeta wergeriyê ya GGG Migration

Di zagona koçberî û ya hemwelatîyê de astên zimên

Dibe ku hûn destûrnameya mayîne (B) yan jî destûrnameya mayîna bêdawî (C) daxwaz bikin. An jî hûn dixwazin serî li stendina mafê hemwelatîbûnê bidin? Almanî ne zimanê we yê yekem e? Wê demê, divê hûn nîşaneyekê pêşkêş bikin, ku hûn bi almanî baş diaxivin.

Li vê derê agahiyên pêwîst ên ji bo serlêdanekê hene:

- Saziya koçberiyê (Migrationsamt)

Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/sprache-und-integration/sprache

Hînbûna almanî

Hûn dikarin di kurseke almanî de almanî baş hîn bibin. Ji bo almanî gelek kursên cihêreng hene.

Derfet

Ji bo almanî gelek kursên cuda hene. Wek mînak:

- Gava zarokên we yê biçûk hebin, biçin kurseke ku libermayîna zarokan hebe.
- Dibe ku hûn tîpên latînî hîn nas nakin an pirsgirêka we bi xwendin û nivîsandinê re heye. Wê demê tev li kurseke nasîna alfabetê (Alphabetisierungskurs) bibin.

Hûn dikarin li vir xwe agahdar bikin, bê kîjan kurs hene û kurs bi çendî ne:

- Ciyê beşa perwerdeya gihîştîyan (Fachstelle Erwachsenenbildung)
- GGG Migration

Astên ziman

Ji bo mirov zanibe, bê kesek çendî bi almanî baş diaxive, mirov dikare li gor Çarçoveya Pêşniyarên Hevbeş ên Ewropî” bipîve. Nivîsîna wê ya bi kinayî GER e. GER pîvaneke ji bo zimanzaniyê ye û ji şeş astan pêk tê: A1, A2, B1, B2, C1 û C2. Ger hûn xwediyê asta A1 yan A2 bin, hûn xwediyê zimanzaniya almanî ya bingehîn in. Gava hûn bigihêjin asta C1 yan C2, hûn gelekî bi pêş dikevin.

- Hûn dixwazin xwendineke pîşeyî ya li Swîsreyê fermî were nasîn bikin? Wê demê pêdiviya we bi asta B1 yan jî B2 heye.
- Gava hûn bixwazin li zanîngehekê bixwînin, pêdiviya we bi asta C1 yan jî C2 heye.

Fînansekirin

Hûn nû hatine Baselê û we mafê destûra mayînê ya B stendiye? Wê demê wê kûponeke ji bo kursa almanî bidin we. Hûn dikarin belaş tev li 80 dersan bibin. Hûn dikarin vê kûponê li ba xwendegeheke ziman a ji aliyê kantonê ve fermî ye bi kar bînin. Kûpon piştî hatina we heta 12 mehan derbasdar e.

Hûn dixwazin piştî jî tev li kurseke almanî bibin? Wê demê, divê hûn ji bo wê pereyan bidin. Buhabûna kursan cihêreng e. Ya baş buhayên wan bidin ber hev. Kanton Basel-Stadt bi dayîna tibabeke pere piştgiriya hinek kursan dike. Hûn ji bo van kursan hindik pere didin.



Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/sprache-und-integration/deutsch-lernen